Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1030 11-Çile- 2023 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165

# Li Qamişlo pêşangeha zarokên Efrînê

**Zarokên Efrînê bi wêneyên ku li Qamişloyê pêşan dan têkoşîn û berxwedanê vegotin.**

Li Navenda Mihemed Şêxo ya bajarê Qamişlo ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji aliyê Komeleya Efrîn a Civakî bi hevkariya Meclîsa Sûriya Demokratîk (MSD) pêşangeha wêneyên zarokên Efrîn û Şehbayê hate vekirin ku di pêşangehê de 100 tabloyên cur be cur cih girtin. Zarokan di wêneyên xwe de êrîşên dewleta tirk li dijî Efrînê, birîndarî, pakrewan, wêraniya Efrînê, cil û bergen Efrîn, dar û zeytûnên afrînê di tabloyê de hebûn. Herêma Efrînê di 20'ê Çileya 2018'an de rastî êrîşên dewleta tirk hat ku gel li hember hemû cureyên êrîşan 58 rojan li ber xwe da. Piştî Efrîn ji aliyê dewleta tirk ve hate dagirkirin, gel neçar ma ku koçberî Şehbayê bibin. Ev pênç sal in gelê Efrînê bi banga têkoşînê berxwedanek bi rûmet raber dikin.



**'Tabloyan de hestên êşê hatiye xêzkirin'**

Têkildarî pêşangehê Endama Komeleya Efrîn a Civakî Mûne Brahîm wiha nêrîn da: "Ev sê rojin pêşangeh vebûye. Nêzî 100 tablo di vê pêşangehê de hatiye pêşendan ku 15 zarokên Efrîn û Şehbayê van wêneyan xêz kirine. Tablo êş, azarî, koçberî û qetîlkirina zarokan, û wiha got: "Xwezaya zarokan ewe ku divê di van temenan de biçin dibistanan bixwînin û xeyala cîhanê xwe xêz bikin, lê mixabin îro zarokên Şehba û Efrînê şer, koçberî, hezkirina xwe ji zeytûn û axa xwe re xêz dikin. Her wiha gelek zarokên Efrînê li Şehbayê di encama êrîşên dewleta tirk ên topan de yan jiyana xwe ji dest didin yan jî perçeyek ji canê xwe didin. Me xwest tabloyên ku zarokên koçber ên Efrînê xêz kirine di pêşangehê de raber bikin û di her alî de em alîkariya wan bikin. Zarok nedikarîn werin vir û tabloyên xwe bidin naskirin, ji ber hatin û çûndin di bin zirûfên ambargoyê de zehmete, loma îro em cihê wan tabloyên wan didin naskirin. Her taployek êşek veşartî têde heye."

**'Gel bi hêviya vegera Efrînê dijîn'**

Mûne Brahîm balkişand li ser êrîşên dewleta Tirk û polîtîkayên guhertinên demografîk ên ku di herêma Efrînê de pêk aniye û wiha pê de çû: "Dewleta Tirk li Efrînê hemû cihên dîrokî û şûnwarên heyî xirabkirin û bi vê yekê re xwestin



êrîşên dewleta tirk ku li dijî Efrînê pêk hatine parve kirine. Ev tablo bi hêstên êşê hatine xêzkirin. Armanca me ji vê pêşangehê ewe ku em alîkariya wan zarokan bikin. Di van demên dawî de ji ber ambargoya ku li Şehbayê pêk hatiye gel û zarok zehmetiyên mezin dijîn, heta ji ber sermayê zarok jiyana xwe jî ji dest dan. Loma me xwest bi vê pêşangehê alîkariya koçberên Efrînê bikin. Gelek kes serdanê pêşangehê bûn û alîkariya xwe ji zarokên Efrîn û Şehbayê re pêşkêş kirin. Ev pêşangeh herkesî tesîrkir, ji ber rastiya ku hatiye jiyîn hatine xêz kirin. Mirov dikarê di mêzekirina her tabloyekî de romanek binivîsîne."

Mûne Brahîm bal kişand xêzkirina wêneyan ji aliyê zarokên Efrîn û Şehbayê guhertina demografîk çêbike. Bi hezaran koçber aniye û li Efrînê bi cih kirine. Loma armanca vê tabloyan ew e ku dagirkeriya tirkiyê raberî hemû cîhanê bikin. Îro darên zeytûnê ku bi hezaran salan hatine çandin, ji aliyê çeteyên dewleta tirk ve tên qutkirin, ev yek êşek mezin dixe dilê Efrîniyan de. Hêvî û daxwaza me ewe ku dê rojek Efrîn vegerê û gel derbasî warên xwe bibin. Em hemû cîhanê berpirsiyar dibînin ku bila rewşa koçberan bibînin. Heta niha jî dewleta tirk bê ser û ber êrîşî Şehbayê dike û dewleta tirk her roj top davêje û di encamê de zarok jiyana xwe ji dest didin. Herî dawî jî dê hêviya gelê Efrînê qut nebe û dê rojek biçin Efrînê, heta niha jî gel li ser piyanin û berxwedana xwe dom dikin." ***-JİNHA***

# Hunerê Kurdî li Sirgûniyê

**Li Şaredariya Parîsê şêwekar û peykersazên sirgûnbûyî yên Kurd pêşangehek vekirin. Li pêşangehê ji bo salvegera mirina her sê jinên Kurd, Sakîne Cansız, Leyla Soylemez û Fîdan Dogan jî pankartek hat daliqandin a ku li serê wêneyên her sê şehîdan hebûn.**

Li Şaradariya Parîsê ya Fransayê piştî haziriya salekê, berhemên 19 şêwekar û peykersazên Kurd hatin nîşandan. Kesên ku beşdarî pêşangehê bûne ji çar parçeyên Kurdistanê ne û bi riya vê pêşangehê hunerê xwe nîşan didin.

Li derveyî avahiya Şaradariya Parîsê, wêneyên her sê jinên Kurd Sakîne Cansız, Leyla Soylemez û Fîdan Dogan hatin daleqandin. Ji bo salvgera mirina wan her wiha di hundirê şaredariyê de jî wêneyên wan hatin daleqandin.

Şaredariya bajarê mezin a Parîsê pêşangeh bi hevkariya Înstîtûya Kurdî ya Parîsê organîze kiriye.

**Di hepsa Hafiz Esed de 7 sal**

Berhemên hunermendên Kurd yên ku ji Kurdistanê sirgûn bûne, bi navê "Hunerê Kurdî li Sirgûniyê" tên nîşandan. Kesên beşdarî pêşangehê bûn bêhtir Kurd û Fransî ne. Yek ji wan şêwekarên ku bi karên xwe yên cuda di pêşangehê de cih girtiye, Xelîl Hemsork ê ji Kobanê ye. Xelîl Hemsork di dema Hafiz Esed de 7 salan di hepsê de maye û di hepsê de fêrî hin teknîkên şêwekariyê bûye. Xelîl Hemsork di hepsê de qederê 1000 tablo çêkirine. Ew dibêje, "Li pişt van karên ku ez niha nîşan didim, serpêhatiyeke min a balkêş heye. Ez 7 salan girtî mam di hepsên Hafiz Esed de. Mixabin di girtîgehê de reng tine bûn, caw jî tine bûn ku li ser wan biresmînim. Tenê paporên gazê û têlên hesin hebûn. Her wiha sindoqên kesk jî hebun. Min 7 salan li ser sindoqên kesk qederê hezar tabloyî çêkirin."

**Di şêwekariyê de berdewamî girîng e**

Şêwekar Teha Xelîl ê ji Silêmaniyê, yê ku niha li Elmanya dijî, li ser rêbazên taybet yên çêkirina wêneyan dixebite û dixwaze di vî warî de teknîkên nû peyda bike. Teha Xelîl got; "Di şêwekariyê de tişta herî girîng ew e ku berdewamî hebe. Divê bi awayekî rojane meriv li ser vî karî birame da ku tiştên nû kifş bike."

**Hestên insan rengan diyar dikin**



Nesrîn Mehmûd jî ku pîşeya wê ya sereke endezyarî ye, lê bi şêwekariyê re jî mijûl e, tevlî pêşangehê bûye. Ew şêwekariyê bi her hêla wê dinirxîne û vê yekê weke cihana xwe bi nav dike. Wê jî hestên xwe bi vî rengî rave kirin; "Reng girîng in, ew ji dilê meriv peyda dibin. Dema tu bi hêrs bî reng jî li wê gorê xwe nîşanî te didin, lê heger tu kêfxweş bî, reng bi awayekî din derdikevin hemberî te. Yanî hest û psîkolojiya meriv di vî warî de tesîrê li xebatên meriv dikin. Dema tu bidî pey hîsên xwe û li dengê dilê xwe guhdarî bikî, reng jî xwe nîşanî te didin û li wê gorê tu diafirînî."

Şêwekarên ku niha li sirgûniyê ne, hestên xwe bi berhemên xwe anîn ziman û tenê ne tablo, her wiha peyker jî di pêşangehê de tên nîşandan. Pêşangeh dê heta 2'yê meha Sibatê li Şaredariya Parîsê vekirî be. ***-Ozgurpolitika***

Sudoku:Pirs 40

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 1 | 3 | 4 | 5 | | | | 6 |
| 2 | | 7 | | | | | | 4 |
| | 6 | | 3 | | | 2 | | |
| | | 4 | | | 3 | | 2 | |
| | | | 6 | | 8 | | | |
| | 2 | | 7 | | | 3 | | |
| | | 6 | | | 5 | | 8 | |
| 9 | | | | | | 6 | | 7 |
| 7 | | | | 1 | 6 | 5 | 9 | |

Sudoku: Bersiv 39

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | 9 | 8 | 5 | 4 | 3 | 7 | 6 | 2 |
| 5 | 4 | 7 | 1 | 2 | 6 | 8 | 9 | 3 |
| 6 | 2 | 3 | 8 | 9 | 7 | 4 | 5 | 1 |
| 2 | 3 | 6 | 7 | 1 | 5 | 9 | 8 | 4 |
| 4 | 7 | 1 | 6 | 8 | 9 | 3 | 2 | 5 |
| 8 | 5 | 9 | 4 | 3 | 2 | 1 | 7 | 6 |
| 7 | 8 | 2 | 3 | 5 | 4 | 6 | 1 | 9 |
| 9 | 6 | 4 | 2 | 7 | 1 | 5 | 3 | 8 |
| 3 | 1 | 5 | 9 | 6 | 8 | 2 | 4 | 7 |

## Quncika Têgînan

| Ajanda (Fransaî) | Bername, rojev, plan, program |
|---|---|
| Bendav | Ciyê ku av lê tê sekinandin. Benda avê, sikir, sike |
| Destwerdan | 1. Tevlîbûna tiştekî di aliyê neyînî de. Mûdaxele: Dest li karê me werdan. 2. Sererastkirina karekî: Dest lê werda, xwe tevlî kir |
| Gundewar | Gund û deverên derveyî bajaran |
| Jêder | Çavkanî, serkanî, ciyê ku tiştek jê tê: Çavkaniya vê nûçeyê ne saxlem e. |
| Jîngeh | 1. Ciyê mirov lê dijîn. 2. Derdor, xweza, tebîet |
| Kanal (Fransî) | 1. Co, ciyê kûr yê av tê re diçe. 2. Dezgeha televizyonê. 3. Rê, rêçik |
| Nexasim | Nemaze, bi taybetî. Dengbêjên berê pir xweş dikirin, nexasim Mihemed Arif |
| Rêje | Mezinayî, pirbûn-kêmbûn, di aliyê dereceyê de girêdana di navbera du tiştan, yan di navbera parçe û tevayiyekê de. Nisbet: Rêjeya xwendekarên serkeftî ji sedî 80 ye |
| Şênî | Kesên li tax, gund, bajarok, navçe û bajaran dijîn: Şêniyên gund dîlan girtbûn |



## Têkoşîna jinan û rizgarbûna ji rejîma desthilatdaran

Berdevka Kongra Star ya kantona Qamişlo Remziya Mihemed bal kişand ser berxwedana jinan li cîhanê û hevgirtina wan bi rêya serhildanên jinên li Rojhelatê Kurdistanê-Îranê û got, sekna li hember rejîmên faşîst yên desthilatdar hêz û berxwedana jinê ye. ***R-2***

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1030 11-Çile- 2023 www.ronahi.net/ku/

# 35 HEZAR ZAROK DI BIN DORPÊÇÊ DE NE













## Li dijî zarokan sucên dij mirovî


- Dijminê mirovahiyê ji xwîna zarokên Kurdan têr nabe

-Dagirkerî komkujiyan li pê hev pêk anîn

-Dorpêça hikumeta Şamê 15 hezar zarok ji xwandinê qut kirin e

-Siyaseta Kuştin û birçîkirinê dewam dike ***R-5***

## Karayilan: Sala 2023'an wê bibe sala 'Serketina Mezin'



Mûrat Karayilan diyar kir ku sala 2023'an wê bibe sala serketina mezin û got, Îro ji Îmraliyê heta hemû qadên siyasî berxwedaneke dîrokî heye, lê navenda berxwedanê qadên ku Gerîlayên Azadiya Kurdistanê ji Zapê heta Dêrsimê lê bi cih bûne ne. ***R-4***

## HPG: Li Zapê 3 dagirker hatin cezakirin

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê ragehand ku di encama çalakiyên Gerîlayên Azadiyê yên Kurdistanê de li Zapê 3 leşkerên artêşa Tirk yên dagirker hatin cezakirin. ***R-3***

## Sûcên li dijî serhildêrên Rojhilatê Kurdistanê û Îranê didomin

Serhildana gel li Rojhilatê Kurdistan û Îran di roja 116'an de bênavber dewam dike, tevî ku rêjîma Îranê li dijî serhildêran şidet, girtin û kuştinê jî dike, lê gel bi biryardariyeke mezin serhildanê geş dike û li ser riya azadiyê dimeşe. ***R-3***

Dorpêça Şêxmeqsûd û Şehba .....
DILYAR CIZÎRÎ *R-4*

Helbest çi ye û helbestvan kî ye
Rûken Silo *R-5*

Li Sûriyê dijî demokrasî komplo...
Zekî Bedran *R-5*

Felsefeya 'Jin Jiyan Azadî' bûye hêviya...
Sozdar Demîr *R-2*

## Xebat û projeyên Desteya Rêveberiya Herêmî û Ekolojîk yên 2022`an



Tevî şert û mercên giran, Desteya Rêveberiya Herêmî û Ekolojîk ya bakur û rojhilatê Sûriyê di sala 2022`an de gelek xebat û projeyên xizmetgûzariyê li herêmê pêk anî. Herwiha bi berdewamiya kar û xebata xwe, ji êrişên dagîrkeriyê re dibe bersiv. ***R-6***

## Navenda zindîkirina mîraseya pêkhateyan: Hunergeha Welat



Hunergeha Welat di çarçoveya xebatên xwe yên zindîkirin û pêşxistina mîraseya herêmê de, zêdetirî 275 stran tomar kirine û ji wan 49 kirine klîb. Hunergeh amadekariyên vekirina beşekî taybet ji bo hunera zarokan dike. ***R-7***

## Yekemîn Konferansa Zanistî Ya Navenda Lêkolînên Jineolojî hat li darxistin

Di bin dirûşmeya 'Ji Têkoşîna Sakîne û Evîn ta Jîna, Zeyneb û Nagîhan Jin Jiyan Azadî' Navenda Lêkolînên Jineolojî Yekemîn Konferansa Zanistî li herêma Şehbayê li darxist . R-3

# Têkoşîn jinan û rizgarbûna ji rejîma desthilatdaran

Berdevka Kongra Star ya kantona Qamişlo Remziya Mihemed bal kişand ser berxwedana jinan li cîhanê û hevgirtina wan bi rêya serhildanên jinên li Rojhelatê Kurdistanê-Îranê û got, sekna li hember rejîmên faşîst yên desthilatdar hêza û berxwedana jinê ye.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Sîstema dewleta Îranê zihniyeta paşverû ya zilm û desthilata zilam li ser jinan dide meşandin û di bin navê islamê de, tundî, êş û îşkence li ser jinan dide kirin. Di bin navê namus û ol de, jin dihatin qetilkirin û tundî li ser wan dihat kirin. Herwiha ji bo astengkirina rola jinan û bêparhiştina wan ji mafên wan, qanûnên giran li ser wan dida meşandin. Vê dawiyê jinan êdî ev desthilatdarî û zihniyet nema qebûl kir. Ji bo wê jî piştî bûyera Jîna Emînî, jin rabûn ser piyan û li



dijî sîstema Îranê ya desthilatdar derketin qadan, herwiha ev nêzî 5 mehe li rojhilatê Kurdistanê û Îranê serhildanên bi pêşengiya jinê didomin. Herwiha bi armanca piştgirî û geşkirina serhiladana jinan li Îranê, li gelek bajarên Cîhanê çalakî tên lidarxistin û kiryarên rejîma Îranê, herwiha siyaseta wê ya faşîst şermezar dikin. Derbarê serhildana jinan li Rojhillatê Kurduistanê û Îranê, herwiha hevgirtina jinan li seranserî cîhanê, Berdevka Kongreya Star ya kantona Qamişlo Remziya Mihemed ji me re axivî û da zanîna ku weke jinên Rojava ewê bi hêrs û hestên xwe piştgirî û destekê bidin serhildana jinên Rojhilatê Kurdistanê û Îranê. Herwiha bang li hemû jinên cîhanê kir ku refên xwe bikin yek û li dijî desthilatdariya mêr û rejîmên desthilatdaran bisekinin.

**Jîna Emînî û Çerxa serhildana jinan li Îran û rojhilatê Kurdistanê**

Ramziya Mihemed destnîşan kir ku Her jinek li Rojhilata Navîn, nûnertiya jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike û axaftina xwe wiha domand: "Kuştina jina ciwan ya bi navê Jîna Emînî û jinên mîna wê sûcekî li dijî mirovahiyê ne. Em her tim dibînin ku jin bi hinceta olê tên kuştin û destdirêjî li ser wan tê kirin. Kuştina Jîna Emînî jî bi hinceta ol û birandina hikmên îslamî bû. Ji bo wê jî Jîna Emînî bû Çerxa serhildana jinan li Îranê. piştî vê hovîtiyê bi pêşengiya jinê gel ji rejîma deshilat re got, 'Êdî Bese'. Ev ji bo jinên cîhanê bû çarenûsa azadiyê."

**`Hêza jinê bingeha azadî û demokrasiya rast e`**

Remziye di berdewamiya axaftina xwe de got, hin civak hêza jinê hêzeke mezin û berçav dibînin, ji ber ku hêza jinê bingehê azadiyê û demokrasiya rast e. Ji ber wê hemû rejîmên desthilatdar dixwazin îrade û hêza jinan bişkînin û hemû şoreşên Rojhilata Navîn bi taybetî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, yên ku bi saya jinê hatine lidarxistin, têk bibin.

**`Bêdengiya wan hêza jinê naşkîne`**

Remziya bîr xist ku tevî ku ewqas



işkenceya li ser jinên Îranê dihat kirin, dewletên cîhanê tev bêdeng iû wiha dirêjî da axaftina xwe: "Heta niha jî cîhan li ser vê yekê bêdenge. Tevî ku niha jin li dijî rejîmê xwepêşandan û serhildan dane destpêkirin jî, tu dewletan têkoşîna van jinan nade diyarkirin. Lewra naxwazin jin bibe xwedî hêz. Ji ber ku baş dizanin ku hêza jinê wê gelek tiştan bi xwe re biguherîne. Ji bo wê bêdeng dimînin. Lê bêdengiya wan hêza jinê naşkîne, wê jin dawiya desthilata zilam bîne." Remziya wiha domand: "Ti kes nikare rê li ber vê serhildanê bigire û ji raya giştî veşêre, lewra îro jinên Cîhanê tev di bin ala azadiya jinê de, li hev kom dibin û çalakiyan li dar dixin."

**Têkoşîn û hevgirtina jinan û rizgarbûna ji rejîma desthilatdar a**

Remziye destnîşan kir ku têkoşîna jinan ya li Rojhelatê Kurdistanê delîl û nîşaneya serkeftinê ye û wiha pê da çû: "Têkoşîn û hevgirtina jinan rizgarbûna ji rejîma desthilatdar ya zordar e. Herwiha azadiya tevayiya jina ye. Çiqas êriş hebin jî li beramberî wê emê hê zêdetir li ber xwe bidin û artêşa xwe xurttir bikin. Herwiha emê li ser asta Cîhanî jî xwe bi hêztir bikin."

Berdevka Kongra Star ya kantona Qamişlo Remziya Mihemed di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Wek jinên bakur û rojhilatê Sûriyê emê piştgiriya hemû tekoşîn, serhilda û şoreşên jinan bikin, bi taybet serhildana ku niha li Îran û rojhilatê Kurdistanê hatiye destpê kirin. Herwiha em bawerin û ev serhildane wê bibe rêya serkeftina azadiya jinên cîhanê."

# `Dirûşma jinan li dijî desthilatdariyê şoreşek e`

**Di salvegera 10`an ji komkujiya Parîsê ya yekemîn ku tê de Sakîne Cansiz û hevalên wê hatin qetilkirin li Silêmaniyê merasîma bîranînê hat lidarxistin. Herwiha jinên tevli bîranînê bûn gotin, wê komkujî nikaribin têkoşîna me rawestînin.**

Li Silêmanî bi boneya salvegera komkujiya Parîsa ya ku di 9'ê Çileya 2013'an li payetexta Fransa Parîsê sê pêşengên jinên têkoşer Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylemez hatin qetilkirin, merasîma biranînê hat lidarxistin. Gelek çalakvan û azadîxwaz beşdar bûn û komkujiya Parîsê şermezar kirin.

**`Jin bi dirûşman şoreşê ava dikin`**

Amîne Elî ya beşdarî bîranînê bû der barê salvegera qetilkirina Sakîne Cansiz û hevalên wê de wiha behsa şoreşa jinan a Rojhilat kir: "Ew têkoşiyan divê em jî piştgiriya wan bikin. Jin ne bi tenê ne



û şoreşger in, li bajarê Seqizê şoreşek derket, jin ne bi çek, bi gotin û dirûşman şoreşê pêk tînin. Her çendî dijmin rê li ber wan digre û dixwaze wan tune bike û dengê wan qut bike jî dê her dem têkoşîna jinan berdewam bike."

**'Ger Kurd yek bin dijmin nikarin tiştek bi wan bikin'**


Amîne Elî bang li hemû jinên her çar parçeyên Kurdistanê kir ku yekitiya xwe ava bikin li hemberî dijminên Kurdan têbikoşin û wiha gotinên xwe domand: "Ji ber bi yekitiya jin û Kurdan dijmin nikare tiştekê bike. Dijmin bi destê xwe



yên reş li Parîsê jinên azadîxwaz qetil dike lê belê bi van komkujiyan nikarin rê li ber xebat û têkoşîna jinan bigrin. Ez weke dayika du şehîdan daxwaza min ji jinan ew e ku piştgiriya jinên Rojhilat bikin, dema jinek li ber xwe dide, dijmin li hemberî wê jinên din qetil dike."

**'Em ê xwedî li xebatên Sakîne Cansiz derbikevin'**

Ronak Sine ya ku xelkê Rojhilatê Kurdistanê û li bajarê Silêmanî dimîne beşdarî merasîma bîranîna sê şoregeran bû diyar kir ku Awropayê behsa, pêşketin û parêzvaniya mafê mirovan dike lê belê



tu mafek tê de nîn e û wiha got: "Dema em behsa jinê dikin jin bingeha azadiyê ye, dijminê Kurd dubare li Parîs komkujî pêk anî û jinên şoreşger kir hedef. Em Kurd weke dara berûyê ne em ê her dem bimînin. Ez weke jinek Rojhilatî ku hevjînê min bi destên dijminê Kurd hat şehîdxistin, vê komkujiyê şermezar dikim. Em ê li pey doza jinên têkoşer bin. Bi dirûşma 'Jin Jiyan Azadî' em ê têkoşîna xwe ya li ser riya Sakîne Cansiz berdewam bikin. Weke malbatên şehîdan heta lutkeya azadiyê, em ê têbikoşin Weke jin me canê xwe daye riya şoreşa azadiyê ji ber wê kes nikare mafên me bixwe." ***JÎNHA***



## Felsefeya 'Jin Jiyan Azadî' bûye hêviya hemû jinan

Sozdar Demîr

'Jin, Jiyan, Azadî', ev duruşme ji berxwe nehatiye gotin. Xwediyê vê duruşmeyê mîmarê azadiyê Rêber Apo ye û Rêber Apo jî van sê hevokên zêrîn weke diruşmeyekê pênase nake, vê hevokê weke bingeha azadî û jiyanê digire dest; weke felsefeya sedsala 20'an pêşkêşî jin û civakan dike.

Rêber Apo ji civaka neolotîk û şoreşa çandiniyê heta niha, rewşa jinê di her warî dahûrand û di nirxandinê xwe de ragihand ku bingehê jiyana rast ya civakê, jina azad e.

Ev nirxandin êdî bûye paşxaneya tevgereke cîhanî û jin li her derê bi vê siloganê li dijî pergalên serdest diqîrin.Ev hevoka ku ji aliyê Rêber Abdulah Ocalan ve hatiye gotin, bi salane bûye çirûska hêviya hemû jinan. Di bin vê siloganê de îro bi hezaran jin li her deverê têkoşîn dikin.

Jinên ku xwediyê fikir û felsefeya Rêber Apo ne ji bo maf û azadiya xwe tenê, ji bo her kêliya jiyanê têdikoşin. Mînaka jinên ku em qala wan dikin jinên pêşeng ku ji bo azadiya jinê li her devera cîhanê de berxwedan kirine ye. Îro dewletên cîhanê ji hêz û vîna jinê ditirsin. Lewma li her cihî, teybet li Kurdistanê jin di hedefa deshilatdaran de ne. Jinên weke Sakîne Cansiz, Evîn Goyî, Jiyan Tolhildan, Nagîhan Akarsel û herweke din, bi hezaran jinên ku li pey maf û azadiya jinê de bûn bi planên qirêj hatin hedef girtin. Gelo çima jin? Di şexsê jinê de dixwazin civakê lewaz bikin û fikrê ku Rêber Apo ji me jinan re pêşkêş kiriye ji holê rakin. Lê dewletên desthilatdar ku bi kuştin û qetilkirina pêşengên civakê sistema xwe ava dike, tu caran serneketine.

Sakîne Cansiz û Evîn Goyî ji bo me tevahî jinan mîrasek pir mezinin, mîrasê ku wan ji bo me jinan hiştiye em ê jî weke jin heta dawiyê lê xwedî derbikevin. Jin wê tu carî tavîz nede hovîtiya desthilatdaran û wê hesabên hemû komkujiyan jî, ji kojeran bipirse. Em xwedî Rêberek weke Abdulah Ocalan in. Wî di hemû kêliya jiyanê de ji bo maf û azadiya jinê têkoşîn kiriye. Lewma çawa ku Rêber Apo dibêje; 'azadiya jinê azadiya civakê ye' em jî Rêber Apo ji xwe re weke sembola jiyanê û azadiyê dibînin. Ji ber ku Rêber Apo di cîhanê de yekem Rêbereke ku jinê weke mîmarê azadiyê û weke jiyan, bi nav dike. Em ê jî vê tekoşîna azadiyê bi silogana 'Jin, Jiyan, Azadî' yê bigîhînin lûtkeyê.



# Navenda zindîkirina mîraseya pêkhateyan: HUNERGEHA WELAT

Hunergeha Welat di çarçoveya xebatên xwe yên zindîkirin û pêşxistina mîraseya herêmê de, zêdetirî 275 stran tomar kirine û ji wan 49 kirine klîb. Hunergeh amadekariyên vekirina beşekî taybet ji bo hunera zarokan dike.

Hunergeha Şehîd Welat, li ser daxwaza şehîd Welat di Tîrmeha 2014`an de hate vekirin. Şehîd Welat endamê rêveber ê Tevgera Çand û Hunerê bû û di dawiya 2013`yan de di êrişên çeteyên Cebhet El Nusra ên li ser herêmê de şehîd bûbû. Ji bo bîranîna şehîd welat û bicihanîna daxwaza wî hunergeh bi navî wî hat vekirin.

Hunergeha Welat li ser asta Rojavayê Kurdistanê-Bakur û Rojhilatê Sûriyê dixebite û bi beşdariya hunermendên herêmê stranên, şoreşgerî, floklorî û neteweyî û klîban çêdike.

**BERHEMÊN HUNERGEHÊ**

Hunergeha Welat ji destpêka ku hatiye damezirandin ve, zêdetirî 275 berhemên hunerî amade nekirine û di nav de 40 klîb wekî; Serêkaniyê û Avaşîn, Hey Zapê, Xurfanî, Serhildan, Şervano, Nazê Nêrgiza Hewşê, Keziyên Tolê, Zeriyên Şeşdaran, Serok û Şêladizê derxistine.

Klîbên ``Awazên Windayê``, ``Kul El Hela`` û ``Rêwanê Resen`` jî terzê jiyana hevbaş a di navbera pêkhateyên herêmê de derdixînin holê û çand û hunera her pêkhateyekî nîşan didin.

Hunergehê 4 dîmenên govendên folklorîk ên pêkhateyên Kurdistan, Bakur û Rojhilatê Sûriyê û 54 xelekên perwerdeya wênegiriyê bi zimanê Kurdî tomar kirin. Ev berhem dê di demeke nêz de werin weşandin.

**ARMANCA HUNERGEHÊ**

Hunergeha Welat bi armanca zindîkirina berhemên hunermendên Kurd ên kevn ê navdar ên ku rola wan di parastina mûzîka Kurdî de girîng e, her wiha ji bo belgekirina dîroka hunerê, reseniya Kurdî û zindîkirina stranên şoreşgerî û folklorîk ên kevn hat damezirandin.

Endamê Hunergeha Welat, Delîl Mîrsaz got: "Rojava, parçeyê biçûk ê Kurdistanê ye, lê di aliyê hunera şoreşgerî de li gorî parçeyên din pir li pêş e. Ji salên 80`î yên sedsala borî heta roja îro ve bi sedan stranên şoreşgerî hatin çêkirin. Niha jî em li hunergehê hewl didin wan stranan bi dengê hunermendên Kurd ên Rojava jinûve pêşkêş bikin û li gorî rewşa gelê herêmê stranên nû tomar bikin."

**BERIYA ŞOREŞÊ, REWŞA MÛZÎKA KURDÎ LI ROJAVA**

Li gorî Mîrsaz, ji ber rewşên ku Kurdistanê tê re derbas bûne û qonaxên veguhastina hunerê di navbera nifşan de, heta astekê dûrketinek ji hunera resen û mîrasî çêbû.

Têkildarî dîroka hunera Kurdî li Rojava Mîrsaz got: "Rojava, bi taybetî Kobanê, Efrîn û Cizîrê xwedî bingeh û hêmanê mûzîkê yê kevn in. Gelek hunermend derketin jiyana xwe xistin xizmeta pêşxistina hunera Kurdî û parastina resentiya wê û bi berhemên xwe mohra xwe li hunera Kurdî dan. Lê di 5 salên borî de, ji aliyê dewleta Tirk a dagirekr ve hewldanên asîmlîsyonê hebûn."

Hunergeha Welat bi berhemên xwe resenî û mîrasa hemû pêkhateyên









herêmê, şoreş û berxwedana gel, jiyana hevbeş derxistin pêş. Her wiha êrişên qirkirinê yên li dijî Kurdan teşhîr kirin.

**AVAKIRINA KESAYETAN LI GORÎ BINGEHÊN HUNERA NETEWEYA DEMOKRATÎK**

Piştî demekê ji damezrandina hunergehê, xebatkarên hunergehê biryar da ku çalakiya xwe ya hunerî fireh bikin, da ku bi awayekî guncaw bi qonaxên şoreşê re bimeşin û pergala xwe ya hunerî û teknîkî bi pêş bixin. Li ser vê yekê dewreyên perwerdê yên pisportiya hunerî û teknîkî ji endamên xwe re vekirin. Endamê Hunergeha Welat ê mamosteyê mûzîkê Serxwebûn Zeyno got: ``Destpêka vekirina dewreyên perwerdeyê gelek astengî li pêş me derketin, ji ber ku pergala hunergehê ji bo me gaveke nû bû. Lê bi demê re û bi israr û girêdana me ya bi hunerê ve me bi hev re ev astengî derbas kirin."

Li Hunergeha Welat perwerde li ser bingeh û rêgezên hunera demokratîk a ku rêber Ocalan pêşkêş kiriye, tê dayîn. Serxwebûn Zeyno got: "Em hewl didin li gorî hunera rasteqîn û ya resen a ku xwe dispêre neteweya demokratîk kesayetên hunerî ava bikin. Em hewl didin di hemû xebatên xwe de, ji naverok, belavkirin, şêwe û armancê cuda bin. Em hunereke xwedî hîmeke fikrî ya li gorî bingehên fikrê neteweya demokratîk dişopînin. Ji ber bûyerên ku li herêmên me rû didin, ji me tê xwestin ku xebateke mezintir bimeşînin û li gorî pêvajoyê kar bikin."


Xwendekarê bi navê Yûsif Osman (21) bal kişand ser gavên ku hunerê avêtine û got: "Min xeyal dikir ku beşdarî qada hunerî bibin. Di hunergeha Welat de xeyalê min bi cih hat û bi awayekî mezin berfireh bû. Hezkirin tenê têra serkeftinê nake. Lê belê îsrar û kedeke mezin tê xwestin. Ji bo avakirina kesayetek hunerî ya rasteqîn Huneregha Welat cihekî guncaw e."




**AMADEKARIYÊN VEKIRINA BEŞA HUNERA ZAROKAN**

Li Hunergeha Welat beşên tomarkirinê, teknîk (dîmen û montaj) û beşa deng hene. Heman demê amadekarî tên kirin ku îsal beşa taybet bi hunera zarokan were vekirin.

Endamê rêveber ê Hunergeha Welat Comerd Hesen got ew hewl didin çalakiyên xwe fireh bikin da ku karibin rewşa gel, berxwedan û şoreşa wî îfade bikin, her wiha hemû stranên folklorîk ên pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê nîşan bidin. Hesen wiha dawî li gotina xwe anî: "Cudahiya hunergehê ew e ku stranên resen ên Kurdî û yên pêkhateyên din ên herêmê tomar dike û dê heta dawiyê çalakiya xwe dewam bike." *-**ANHA***



## Helbest çi ye û helbestvan kî ye

Rûken Silo

Em weke komelên mirovaniyê di jiyanê de, destxet û pîşesaziyên jîweriya civakê û jiyanê saz dikin û didine radan. Lewra tu mirov nînin di jiyanê de ku peywendiyên wî li gel helbestê nebe. Çi helbesta tirazo be û çi helbesta seretayî û sivik be, ango helbesta awazkî ya ji bo stranan. Û bi taybet ev nifşê helbestê li ser devên hemo miştaxeyên civakê tên gotin.

Lê weke tê diyarkirin û em dizanin ku saz bi stiranê ve girêdayî ye û her wiha stiran bi awayekî bingehîn bi helbestê ve girêdayî ye. Çi helbesta seretayî li ser lêv be, yan jê helbesta fermî û tirazo be. Ji ber ku helbest di pêpelûnkên bilind de, di nava civakê de tê nirxandin. Herwiha helbestvan jî di asoyên bilind de, di nava civaka xwe de cih digre.

Lê belê giringe ku em zanibin, helbest çi ye û helbestvan kî ye nava komeleyên civaka xwe de. Helbest bi xwe dirûveke bi qeşengerî û keşxebûnê ve tê girêdan.

Li gel peywendiyên resen yên ku bi wijdana mirovaniyê û bi jiyanê ve tê mirçiqandin ji layên hî û banandin- hestyarî - vîndarî -di şîn û warşînan de - di keyf û şahiya de di pesindarî û zîmara de.

Lê helbest bi xwe di kakila xwe de , ferwarekî hemo şînahî û fereşîn ji ziman ava dike ta ku kûraniya kesayetî û hebûna xwe pê îfade bike.

Lê belê helbestvan gava ku dinivîse ne gelek giringe ku kesên li derdora wî bi hizr û ramanên wî yan jê bi bîr û baweriyên wî razî be yan jê ne razî be.

Jiber ku carcaran ew kesên ku li derdorê wî bi awirekî nakok helbestê dinirxînin û di serê xwe de berûvajî şîrove dikin. Lê helbest şîpêleke zengîne li hest û bîrên helbestvan dide û ji goşeyên bîrwerî û jibîrkirina û hêlanên wî de dilive .

Her wiha helbest bi xwe alavek ya bi destgeh û karanîna şaxên herî giring di avakirina civakekî sinçî de.

Lê ew jî weke her pîşeyekî di civakê de xwe parve dike.

Lê helbestvan bi xwe jî gelek çûre û birên wan hene . Hindek ji wan helbestvanên bi dirist û semîmî bi awayekî resen helbestê dihûnin , mînak : Baba Dahir , Melayê Cizîrî , Ehmedê Xanê , Cîgerxwîn, Şêrgo Bêkes , Tîrêj.

Herwiha Lorî Tidarî , Salihê Heydo , Melevan Resûl , Evîndarê Xemgîn...

Lê ne ji mafê me ye heger em bêjin helbestvanekî gereke tu wiha binvîse ango em tiştekî li ser ferz bikin û hizir û remanên wî deynin di bin bend û qeydan de û bixin di bin bar de.

Lê belê ji mafê me ye em helbesta wî binirxînin û di bin pîvanên rexneyê re derbaz bikin.

Lê xeterî û tehlûkeya herî mezin û xwedîkuj li ser helbestê û helbestvanan, dema kû peyvên erzan û nedicihê xwe de bikar tînin û dûbare dikin, di helbesta xwe de .

Bi taybet helbesta pesindariyê jiber ku helbesta pesindariyê ya herî lewaze di nav kerwanê wêje û tûreya gelan de .

Ew bi xwe helbesteke mişt e ango tijiye ji derew û gotinên dûr aqil .

Lê cidabûnekî daniyar û zelal peyda dibe, di navbera helbesta pesindarî û helbesta zîmarî û ya êş û azaran de.

Jiber ku helbesta zîmarî ango ya xemgînî ji asoyekî rast û dirist ji nav hestên helbestvan der tên .

Jiber ziman û şêweyên pesindariyê şêweyekî helawestiye bi nedirustiyê ve .

# Xebat û projeyên Desteya Rêveberiya Herêmî û Ekolojîk yên 2022`an

**Tevî şert û mercên giran, Desteya Rêveberiya Herêmî û Ekolojîk ya bakur û rojhilatê Sûriyê di sala 2022`an de gelek xebat û projeyên xizmetgûzariyê li herêmê pêk anî. Herwiha bi berdewamiya kar û xebata xwe, ji êrişên dagîrkeriyê re dibe bersiv.**

**Darîn Silê/Qamişlo**

Di şoreşa Rojava de bi avakirina Rêveberiya Xweser li bakur û rojhilatê Sûriyê, desteya Rêveberiya Herêmî û Ekolojîk, hat avakirin. Desteyê di nav xwe de şaredarî, rêveberî û komîteyên girêdayî wan dihewîne. Herwiha plan û bernameyên stratejîk yên xebatan; projeyên giştî yên şaredariyan diyar û amade dike. Ji wê demê ve gelek projeyên xizmetgûzarî li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê pêk aniye û heta niha jî bi awayekî rêxistinkirî xizmeta gelê herêmê dike, kar û xebata xwe ya resen didomîne.














### Tevî şert û mercên giran gelek projeyên xizmetguzariyê hatin pêkanîn

Desteyê her sal projeyan pêk tîne û hewl dide ku li herêmê xizmetgûzariyê xurttir bike. Di sala borî ya 2022`an jî tevî rewşa awarte, êriş û kiryarên dewleta Tirkî ya dagîrker yên li dijî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, desteyê gelek xebat û projeyên xizmetguzariyê, bi taybet yên ziftê, avê û serfa sihî pêk anî û bû bersiva êrişên dagîrkeriyê.

### Projeyên 2022`an yên herî mezin û girîng

Herwiha projeyên herî mezin û girîng ku di sala 2022`an de hatin pêkanîn, weke projeya ziftkirina rêya Qamişlo-Dêrik, rêya Ambara Diwelî li Qamişlo, projeya Pira El Reşîd ya nû li Reqayê, herwiha projeyên ronîkirinê li gelek herêm û bajarên bakur û rojhilatê Sûriyê û projeya baxçeyeke mezin li bajarê Hesekê li ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê.

### Rêjeya bûtçe(xerçkirina) Desteyê ya 2022`an

Rêjeya bûtçe desteya Rêveberiya Herêmî û Ekolojîk, ya sala 2022`an 6 milyon û nîv dolar bû, ku ev rêje jî li gorî pêwîstî û pêdiviyan têra tevayiya projeyên xizmetguzariyê yên li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê nekir. Ji ber ku gelek proje di sala borî de hatin pêkanîn û piraniya wan jî projeyên mezin û berfireh bûn.

### Xebat û projeyên sala 2022`an

Di destpêka Sibata 2022’an de, tevayiya şaredariyên girêdayî Desteya Rêveberiya Xwecihî û Ekolojîk projeyên xizmetguzariyê li tevayiya herêman bi cih anîn. Ev proje hin ji wan bi dawî bûne û hin jê jî heta niha dewam dikin; weke rêya navbera Qamişlo û Dêrikê ya bi dirêjahiya 100 km ku ji sedê 5 hatiye çêkirin û Pira Wanîk jî hê berdewam in. Herwiha rêya Ambara ku bi dirêjahiya 10.5 km ye sedê 85 , Projeya Pira Elbêrûnê sedê 30, projeya pira Reqayê ya nû sedê 10, projeya amadekirina baxçê gel li Hesekê sedê 25, rêya Beyrûnê sedê 50 hatine çêkirin. Projeya ziftê ya rêya Beko-Hitîn û rêya Reqa-Heseke jî bi dawî bû ye. Herwiha projeya avahîsaziya Desteyê sedê 60, Projeya Rêya Maroda ya bi dirêjahiya 34 km sedê 80, Projeya rêya Til Elsimin-Hizêma ku dirêjahiya rêyê 12 km ye sedê 85, rêya Til Elsimin-Eyn Îsa ku dirêjahiya wê 25 km bû sedê 50 hatiye çêkirin û Rêya Siêdiyê ku dirêjiya wê 14 km ye jî bi dawî bûye. Projeya amadekirina parzûna Bîtomîn, garaca başûrê Reqayê, garaca Xiwêran û Projeya Daristana Firûsiyê li bajarê Reqayê jî hatine bidawîkirin. Li gel projeyên ziftê, desteyê gelek xebatên kenalên ava qirêj kirine û zêdetirî 100 Km ji tûreyên van kanalan hatine saxlemkirin û çêkirin.

### Zehmetî û astengiyên desteyê

Zehmetiyên ku di sala borî de bi desteyê re derbas bûn, wek rewşa aboriya herêmê, kirîza aborî, seqamgerî, kêmbûna kesên pispor di nava şaredariyan de, êrişên dagirkeriyê û rewşa awarte ya ku Rêveberiya Xweser li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ragihandibû. Jixwe rewşa herî girîng ewlehiya herêmê ye, her kes dizane ku rojane êriş li ser herêmê tên kirin. Êriş û kiryarên dagîrkeriya tirkî, bi taybet êrişên ser navendên xizmetguzariyê û qutkirina Ava Firatê. Ev tev bandorê li xizmetguzariya herêmê dikin. Lê tevî zehmetî û astengiyan jî Desteyê heta asteke bilind xebat û projeyên mezin li tevayiya herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê pêk anîn.

### Proje û plansaziya dema pêş

Desteya Rêveberiya Herêmî û Ekolojîk di destpêka her salekê de, plansazî û projeyên xizmetguzariyê yên dema pêş diyar dike. Di nav proje û planên paşerojê yên Desteyê li bakur û rojhilatê Sûriyê, tekezî li ser pêkanîna berdewamkirina projeyên ziftê hat kirin, pêkanîna projeya Mexberên Herêmî, tamîrkirina Keracan û çêkirina qebanan.

### Encamên civîna salê ya 2022`an ya Desteya Rêveberiyên Herêmî û Ekolijîk

Di civîna salê ya Desteya Rêveberiyên Herêmî û Ekolijî ya 2022`an de, ev biryar hatin dayîn; Vekirina çar akademiyên ku asta hemû xebatkarên di rêveberiyê de bi pêş bixîne, çêkirina enerjiya tîrêjê ji bo projeyên xizmetguzariyê, herwiha temamkirina lêkolîna plana rêxistinî li bajarê Hesekê û piştre li hemû herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, karkirina li ser pirojeyên ziftê, berdewamkirina nûavakirina piran û peydekirina madeya Bîtomîn ji bo hemû xebatên ziftê.



# HPG: Li Zapê 3 dagirker hatin cezakirin

**Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG’ê ragehand ku di encama çalakiyên Gerîlayên Azadiyê yên Kurdistanê de li Zapê 3 leşkerên artêşa Tirk yên dagirker hatin cezakirin.**



**Navenda nûçeyan**

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG’ê bi daxuyaniyekê ragehand ku di encama çalakiyên bibandor yên hêzên wan, li Zapê 3’ê leşkerên Tirk yên dagirker hatin cezakirkin û wiha got: “Hêzên me li herêma Zapê di çalakiyan de 3 dagirker ceza kirin. Artêşa Tirk a dagirker carekê bi çekên kîmyewî bombe li çeperên berxwedanê yên gerîla barand. Li pêşiya çeperên berxwedanê malzemeyên plastîk û lastîkên wesayitan şewitand û dûyê bi jehr ber bi çeperan ve şand. Di heman demê de bi dehan caran bi obus û çekên giran bombardûman kir.”

HPG’ê derbarê agahiya de wiha got: “Di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Bazên Zagrosê de li herêma Zapê, 9’ê Çileyê saet di 09:20 û 09:40’î de li nêzî qada Çemço ya nehiya Şêladizê ya navçeya Amediyê, tîmên me yên bi tevger 2 caran bi çekên giran li dagirkeran xistin. Di encamê de 2 dagirker hatin cezakirin Herwiha, 9’ê Çileyê saet di 11:00 de li nêzî qada Çemço ya nehiya Şêladizê ya navçeya Amediyê tîmên me yên bi tevger carekê bi sûîqestê li dagirkeran xistin. Di encamê da dagirkerek hate cezakirin”.

HPG’ê derbarê êrîşên artêşa Tirk a dagirker ên bi bombeyên qedexekirî û çekên kîmyewî wiha got: “9’ê Çileyê saet di 16:30’î de çeperên bexwedanê yên gerîla yên li nêzî qada Çemço ya nehiya Şêladizê ya Amediyê carekê bi çekên kîmyewî hatin bombekirin. Di heman demê de li pêşiya çeperên berxwedanê malzemeyên plastîk û lastîkên wesayitan şewitand û dûyê bi jehr ber bi çeperan ve şand. 9’ê Çileyê Girê FM’ê û çeperên de çeperên yên gerîla yên li nêzî qada Çemço ya nehiya Şêladizê ya Amediyê bi dehan caran bi obus û çekên giran hatin bombekirin.”

# MSD û Hevbendiya Nîştimanî ya Sûriyê li hev kir

**Navenda Nûçeyan**

**MSD`ê û Hevbendiya Nîştimanî ya Sûriyê plana xebata hevbeş ji bo çareserkirina krîza Sûriyê eşkere kir û got, Gelek xalên hevbeş di nava MSD`ê û Hevbendiya Nîştimanî ya Sûriyê de hene û dê ew xal di qonaxa bê de bi awayekî pratîk pêk bên.**

Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) û Hevbendiya Nîştimanî ya Sûriyê civîneke çapemeniyê li ser serdana dawîn ya di 27`ê Kanûna 2022`yan de û rêzecivînên di navbera her du aliyan de, li dar xist.

Di civîna çapemeniyê de, hevseroka MSD`ê Emîne Omer û




sekreterê giştî yê Hevbendiya Nîştimanî ya Sûriyê Aram El Domanî axivîn. Civîn li Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk a Qamişloyê hate lidarxistin.

Emîne Omer di derheqê civînê de wiha got: “Me gelek mijar û dozên girêdayî hemû sûriyan nîqaş kirin. Ji wan jî mijara gef, berjewendî û armancên dewleta Tirk ên hewldana dagirkeriya wê, mijarên girêdayî sûc û guhartina demografîk li Sûriyê, mekanîzmaya vegera hemû koçberan li herêmên xwe, hat nîqaş kirin.”

Emîne Omer wiha domand: “Me nêzîkbûna Sûriye-Tirkiyê ya bi navbeynkariya Rûsyayê û encamên wê yên ku xetereyên ewlehî çê dike, bêîstîqrariya li herêmê, astengiya çareserkirina krîza Sûriyê û gihandina ber bi çareyeke siyasî ji hemû aliyan re û êrişên terorê li herêmê, nîqaş kirin. Her wiha me kedên ji bo çareya siyasî li gorî biryarên navneteweyî, bi taybet biryara 2254`an jî nîqaş kirin.”

Emîne Omer wiha dawî li gotina xwe anî: “Gelek xalên hevbeş di nava MSD`ê û Hevbendiya Nîştimanî ya Sûriyê de hene û dê ew xal di qonaxa bê de bi awayekî pratîk pêk bên.”

Sekreterê giştî yê Hevbendiya Nîştimanî ya Sûriyê Aram El Domanî jî serkeftinên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê pîroz kir û wiha got: “Ev serdan, piştî gelek hevdîtinên di navbera MSD`` û Hevbendiya Nîştimanî ya Sûriyê li Washingtonê û Ewropayê de pêk hatin. Di nava me de gelek armancên hevbeş hene. Ev serdan ji bo nasîna mekanîzmeya rêveçûna xebata rêveberiya sivîl de pêk hat. Me tecrubeya wê di van salan de li ser asta Sûriyê ji bo xizmetkirina şêniyan, belavkirina ewlehî û îstîqrarê de li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dît.”

El Domanî wiha pê de çû: “Armancên hevbeş ên me û MSD`ê ew in ku çareyên siyasî ji bo bidawîkirina azarên gelê Sûriyê pêk bên in. Îro gelê Sûriyê bi gelek astengiyan re bi rûb rû ye û ji destpêka civînên Astanayê de êrişên bi çek li herêmê pêk tên. Di encamê de guhartina demografîk li Sûriyê hat çêkirin, herêmên başûr radestî rejîma Sûriyê bûn û gelê wê koçberî bakurê Sûriyê bû.”

Aram El Domanî di dawiyê de spasiya MSD`ê li ser dîtina formeke hevbeş di navbera hêzên neteweyî yên demokratîk de ji bo pêkanîna çareyeke siyasî û guhartina demokratîk a li Sûriyê kir.

# Sûcên li dijî serhildêrên Rojhilatê Kurdistanê û Îranê didomin

**Navenda Nûçeyan**

**Serhildana gel li Rojhilatê Kurdistan û Îran di roja 116’an de bênavber dewam dike, tevî ku rêjîma Îranê li dijî serhildêran şidet, girtin û kuştinê jî dike, lê gel bi biryardariyeke mezin serhildanê geş dike û li ser riya azadiyê dimeşe.**

Serhildana gel yên li Rojhilatê Kurdistan û Îranê ku piştî qetilkirina jina Kurd Jîna Emînî dest pê kir, di roja xwe ya 116’emîn de didome. Xwepêşandanên gel roj bi roj berfirehtir dibin. Tevî ku rêjîma Îranê li dijî xwepêşanderan girtin, işkencekirin û koştinê jî dike, gel dst ji doza azadiyê bernade û serî radike.

Li gorî malperên Îranê yên fermî rêjîmê ji destpêka serhildanên




gel yên ku di 16’ê Îlona 2021’an hatibû destpêkirin û heya niha 4 çalakvanên ku tevlî xwepêşandanan bûne darve kir, herwiha cezayê bi darvekirinê li çar ciwanên din birîn e.

Yek ji wan ciwanên ku mehkumê cezayê darvekirinê bûye jî, ciwanê Belûç Kambiz Khroûte, li gorî nûçeyên hatine belavkirin, ciwanê Belûçî bi hinceta şewitandina bankekê bi sûcê muharebe û gendeliya li ser rûyê erdê, mehkûmê cezayê darvekirinê hat kirin. Ev yek piştî ku xwepêşanderan diyar kirin ku banka ji aliyê kesên bi cil û bergên sivîl hatine şewitandin û dikana Kambiz Khroût li kêleka banka ye. Kambiz Khroût piştî ku hat girtin, bi kefalet hat berdan û careke din hat gazîkirin û mehkûmê cezayê darvekirine hat kirin.

Herwiha rêjîma Îranê cezayî darvekirinê li 3’ê xwepêşanderên ku di xwepêşandanan de hatibûn girtin, birî. Di heman demê de 5 xwepêşander jî mehkûmê 58 sal cezayê girtîgehê hatin kirin.

Li gorî agahiyên ku hatine parvekirin, rojnamevan û xwendekara rojnamevanî ya zanîngeha Alameh Tabatabaî Nazîla Marûfîan, çalakvana sendîkaya mamosteyan Jîla Kheîr hat berdan, nivîskara Blogê ya Tebrîzî Sonia (Sona) Rahmanzadeh û ji Zanîngeha Terbiat Modares a Tahranê mezûna hunerê Zohreh Jam bi kefaleta hatin berdan.

# Yekemîn Konferansa Zanistî Ya Navenda Lêkolînên Jineolojî hat li darxistin

**Navenda Nûçeyan/ Şehba**

**Di bin dirûşmeya ’Ji Têkoşîna Sakîne û Evîn ta Jîna, Zeyneb û Nagîhan Jin Jiyan Azadî’ Navenda Lêkolînên Jineolojî Yekemîn Konferansa Zanistî li herêma Şehbayê li darxist .**

10’ê Çileyê li herêma Şehbayê, bi beşdarbûna 200 jinên xebatkar li kampa serdem Yekemîn Konferansa Zanistî ji aliyê Navenda Lêkolînên Jineolojî ve tê lidarxistin.

Konferans bi deqeyek rêzgirtinê li ser giyanê şehîdên azadiyê hat destpêkirin, piştî wê li ser jiyan û têkoşîna şehîd Nagîhan Arkesal sînevizyonek hat nîşandan.

Piştê nîşandana sînevisyonê perspektîfên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji aliyê endama Navenda Jinoelojî Rûjiyan Husên ve hatin xwendin û axaftina vekirina konferansê hat kirin .

Bernameya konferansê bi vî awayî ye :

Xwendina encama lêkolînên







Navenda Jineolojî (Heleb- Efrîn).

Pêşkêşkirina şanoyekê ji aliyê jinên ciwan ve.

Komxebatê wê werin lidarxistin li ser 4 mijaran wê werin çêkirin :

-Tundiya li ser zarokan
-Pêşxistina aboriya jin ya komînal
-Tundiya têkneolojî
-Hezkirina cins

Herî dawî wê ji aliyê Kevana Zêrîn ve şahî were lidarxistin.

# Karayilan: Sala 2023'an wê bibe sala 'Serketina Mezin'

Mûrat Karayilan diyar kir ku sala 2023'an wê bibe sala serketina mezin û got, Îro ji Îmraliyê heta hemû qadên siyasî berxwedaneke dîrokî heye, lê navenda berxwedanê qadên ku Gerîlayên Azadiya Kurdistanê ji Zapê heta Dêrsimê lê bi cih bûne ne.

**Navenda Nûçeyan**



Fermandarê Biryargeha Navenda Parastina Gel (NPG) Mûrat Karayilan li ser cîhaz, ji gerîlayên azadiya Kurdistanê yên li qada şer re axivî û derbarê êrîşên dewleta Tirk a dagirker nirxandin kir. Mûrat Karayilan di destpêka axaftina xwe de şehîdên berxwedana sala 2022'an bi rêz û hurmet bi bîr anîn û got: "Em ê li ser soza xwe ya dilsozî û serketinê ya ji bo şehîdên xwe bin. Ew nirxên me ne, bingeha hebûna me ne. Em wan wek ronahiya serkeftinê, pêşengên azadiya Kurdistanê, dibînin û di rêya serketinê de wê bibin çavkaniya hêza me."

### 'Dijmin di sala 2022'an de derbên giran xwarin'

Karayilan diyar kir ku wan, saleke girîng li pey xwe hiştin û wiha dewam kir: "Sala 2022'an bû sala berxwedaneke mezin. Weke ku tê zanîn dijmin hesab kiribû ku wê di sala 2022'an de bi ser bikeve, tecrîda girankirî ya li ser Rêber Apo berdewam kir û zextên xwe yên li ser gelê Kurd û siyaseta Kurd girantir kirin. Ji aliyê din, di êrîşa xwe ya li ser Herêmên Parastinê yên Medyayê bi

taybet li dijî Zap, Metîna û Avaşînê de, xwest di nava çend hefteyan de encamekê bistîne. Tevî hemû derfetên teknolojîk ên di destê dagirkeriya Tirk de, bikaranîna çekên ku ji aliyê cîhanê ve hatine qedexekirin û hemû piştgiriya PDK'ê jî, ew di sala 2022'an de bi ser neket û derbên giran xwar.

Karayilan da zanîn ku dewleta Tirk di sala 2022'an de bi dagirkirina sînorên Mîsak- Millî xwest bigihêje encamê û got, bi saya berxwedana gerîlayan dagirkerî li Zap, Metîna û Avaşînê asê ma. Dagirkeriya Tirk navê êrîşên xwe kiribû 'Pençe-Kilît', lê bi xwe li Zapê asê man. Çend roj şûnd de 9 meh derbas dibin û lê dijmin hê jî hemû qadên ku dixwest dagir bike, nekariye dagir bike.

### 'Ev berxwedan xwedî roleke dîrokî ye'

Karayilan derbarê lehengî û berxwedana dîrokî ya girîlayên azadiyê de wiha got: "Ev di dîroka gelê me de tiştekî nû ye. Berxwedana li rojhilatê Zapê di dîroka gelê me de yekemîn e. Tişta ku qewimî, mînakeke mezin e ku komeke şervan çawa artêşeke birêkûpêk û xwedî çek, têk dibe. Ya duyemîn jî girîngiya siyasî û civakî ya vê berxwedanê gelekî mezin e. Ji bo gelê me û ji bo me ev berxwedan, berxwedana hebûnê ye. Vê berxwedanê rê neda hikûmeta AKP-MHP'ê ku polîtîkaya qirkirinê bi ser bixe. Ev berxwedan xwedî roleke dîrokî ye. Ji ber ku ger hikûmeta AKP-MHP'ê di şerê van 2 salên dawî de serkeftî bibûye, wê xwe li Tirkiyeyê mayînde bikira."

### 'Sala 2023'an wê bibe sala serketina mezin'

Karayilan diyar kir ku sala 2023'an wê bibe sala azadiya gelê Kurd û Rêber Apo û wiha got: " Sala 2023'an wê bibe sala serketina mezin û têkçûna rejîma qirker a faşîst. Bêguman helwesta li Îmraliyê, berxwedana li hemû zindanan, berxwedana li Bakur, Başûr û Rojhilatê Kurdistanê ku bi dirûşma 'Jin, Jiyan, Azadî' pêk hat, gelekî bandor kir. Lê belê navend; Zap, Avaşîn û Metîna ye. Ger li vir bi ser biketana, wê dijmin zêdetir zext li Rêber Apo bikira ku gav bi paş de biavêje û wê siyaseta Kurd, demokratîk û çep hîn bêhtir biperçiqanda. Îro ji Îmraliyê heta hemû qadên siyasî berxwedaneke dîrokî heye, lê navenda berxwedanê qadên ku Gerîlayên Azadiya Kurdistanê ji Zapê heta Dêrsimê lê bi cih bûne ne."

### 'Yên vê berxwedanê pêk tînin, yên herî zêde nêzî Rêbertî ne'

Mûrat Karayilan da zanîn ku jin û mêrên Kurd ên ku li ser esasê îdeolojiya Rêber Apo xwe bi rêxistin dikin, berxwedaneke bêhempa nîşan didin û wiha dewam kir: "Ev 9 meh in li hemberî êrîşên dijwar ên bi her cure çekên kîmyewî berxwedan, ne bûyerek asayî ye. Fermandarê berxwedana Şehît Şahîn hevrê Bager Gaver gotibû;'Bi vê berxwedanê re em xwe bêhtir nêzî Rêbertî dibînin.' Belê, yên vê berxwedanê pêk tînin, hevrêyên herî zêde yên nêzî Rêbertî ne. Em ji bo bi Rêbertiya xwe re bibin hevrêyên dilsoz, di nava têkoşînê de ne û yên ku îro pêşengiya vê têkoşînê dikin, hevrêyên ku di qadên berxwedanê de vî şerî dimeşînin; Îro dîrokê dinivîsînin, îro pêşengiya vê govenda berxwedanê dikin."

### 'Divê em têkbirina dijmin garantî bikin'

Fermandarê Biryargeha Navenda Parastina Gel (NPG) Mûrat Karayilan da xuyakirin ku dijmin di nava tirsê de ye û got, Divê hevrêyên me jî bizanibin ka rolek çawa dilîzin. Îro çavê her kesî li wan e, bi taybetî jî gelê me. Ji ber vê yekê, divê hevrê jî li ser wê yekê bisekinin ku berxwedanê çawa bi serketinê tacîdar bikin. Em bawer in ku hevrêyên me yên ku ev 9 meh in li hemberî dijmin xwedî ezmûn in, wê dawiya dijmin jî bînin. Dijmin bi lez û bez e, di nava tirs û panîkê de ye, ji ber ku dizanin ku eger hewa biguhere, wê nikaribin xwe li dora çeperên berxwedanê

bigirin. Ger derfet bê bidestxistin, tîmên qadê dikarin zêdetir rola xwe bilîzin. Pêvajoya têkbirina dijmin dest pê kiriye, divê em vê pêvajoyê heta dawiyê bimeşînin û têkbirina dijmin garantî bikin."



## Dorpêça Şêxmeqsûd û Şehba beşekî ji itîfaqa Esad û Erdogan e!

**DILYAR CIZÎRÎ**

Hikûmeta Şamê û Tirkiyê ku dijminatiyek mezin di navbera wan de hebû, li gorî daxuyaniyên Erdogan di şert û mercên heyî de wê tu carî nikaribin lihev werin û pirsgirkên xwe çareser bikin. Di vê demê de nêzî hev dibin û di asta wezîrên Parastinê hevdîtin pêk anîn. Niha jî behsa hevdîtinên di astên jordetir jî tê kirin. Şêfê van hedîtinan jî Rûsya ye. Hemû hevdîtin, bi serkêşiya Rûsiya û Serokê wê Pûtin pêk hatin e. Niha jî amadekariyên zêdetir ên pêşxistina hevdîtinan tê kirin. Di rewşeke wiha de Emarîka diyar dike ku ew li dijî lihevhatina bi Serokê Sûriyayê Beşar El-Esad e û bang li hemû welatan dike ku li hevhatinan bi wan re neke. Lê em dinerin welatê ereb Îmarat ku bêyî Emarîka nikare tu gavan bavêje, behsa hevdîtinên bi Esed re dike û di heman demê de dixwaze di hevdîtinên rayedarên hikûmetên Şamê û Enqerê re de jî rol bilîz e. Ketina Imarat a ser xeta lihevhatina bi hikûmeta Beşar El-Esed, gumanan çêdike. Di nerîna min de gavên Erdogan ji bo hevdîtina di navbera xwe û Beşar el-Esad, bi agahî û xebera Emarîka ye jî. Ew jî hesabê dikin ku Erdogan wê piştî hilbijartinan jî bimîne û destê wî hîn zêdetir bi aliyê Rûsiya ve wê xurt bibe. Lewma pêwîste mirov baş bibîne ku Emarîka jî beşekî plan û itîfaqên di herêmê de têne lidarxistin û li gorî berjewendiyên xwe destwerdanê di her tiştekî de dikin. Ketin Imarat a ser xeta lihevhatine bi hikûmeta Esed re jî, di vê çarçoveyê de pêk hatiye. Li gorî şîrovekirina hin lêkolîneran hikûmeta Erdogan di van mijaran de ji bo hilbijartinên Tirkiyê yên pêş, dixwaze gavan bavêje.

Ev Itîfaq û hevdîtinên di navbera hikûmeta Şamê û Enqere de, di serî de li dijî Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê û gelê herêmê ye. Dorpêça şidandî ya li dijî herêma Şehba û taxa Şêxmeqsûd a Helebê jî yek ji encama wê ye. Ji ber wê jî em dinerin hikûmeta Şamê li ber çavên Rûsiya, Îran û hemû cîhanê bi sedhezaran koçberên Efrînê yên li Şehbayê û şêniyên taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê xistine dorpêça şidandinê. Ji ber wê jî em dinerin tevî ji ber dorpêça hikûmeta Şamê, zarokên bê guneh ji serma jiyana xwe ji dest didin. Ev jî sûcê şer û binpêkirina hemû yasa û zagonên navdewletî ye, lê tu alî dengê xwe nakin. Naxwazin van rastiyan bibînin û hikûmeta Şamê û dewleta Tirk mehkûm bikin. Dibe hin kes bêjin dorpêça li Şehba û Şêxmeqsûd ne tiştekî nûye, raste ji berê ve dorpêç hebû lê tu carê di vê astê de ne hatiye meşandin. Bi vê jî armanc dikin rêveberiya xweser hîn zêdetir tengav bikin.

Beşekî din ê itîfaqên wan jî, em dinerin di nava civaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê de mijarên wan lihev kirine û dawî li hebûna me bînin, têne belavkirin. Di encamê de her çendî em dibêjin Rûsya serkêşiya plana hevdîtinên wan dike, lê xuya dike ku Emarîka jî ji van hevdîtinan ne dûre.



# Li dijî zarokan sucên dij mirovî

Di nava bêdengiya cîhanê de gelê Efrînê ku koçberî Şehbayê bûne, ji tevayiya mafên xwe bê parin. Li aliyekî êrêşên dewleta Tirk a dagirker û li aliyê dijî dorpêça hikumeta Şamê teybet jiyana zarokên vî geli xistine xeteriyê. Tevî hemû sûcên dijmirovî yên derheqê zarokên Şehabayê jî, cîhan ker, kur û lal e.

**Zana Roj/ Şehba**

Aloziya Sûriyê 12 sal li pê xwe hişt. Şer, birçîbûn, girtin, revandin, kuştin û koçberkirin jî hîn berdewam e. Para herî mezin ji êrîşan jî ya herêmên Bakur û rojhiêlatê Sûriyê ye. Di van herêman de yên ku herî zêde êş dîtin û hîn jî dibînin, zarokên herêma Şehabyê ne. Zarokên koçberên Efrînê ku li herêma Şehbayê dimînin, pir zehmetiyan ji ber êrîşên dewleta Tirk a dagirker û dorpêça hikumeta Şamê , dibînin. Zarokên li Şehbayê ji tevaiya mafên xwe yên wekî jiyana bi ewle, xwendin û xewin û xeyalên zaroktiya xwe, bê par man e.

### Kiryarên dagirkeriyê yên derheqê zarokan de li Efrînê

Dewleta Tirk a dagirker li seranserî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, bi dehan komkujî li dijî zarokan pêk anîn e. Bi taybetî jî, li Efrînê. Dagirkeriyê bi dehan caran, dibistanên zarokan bi awayekî rasterast kiriye armanca êrîşên xwe. Li gorî Rêxistina Mafê Mirovan di êrîşên dewleta Tirk yên li ser Efrînê ku di 20'ê Çileya 2018'an de hatibûn destpêkirin de, zêdetirî 650 welatiyan ku di nav de 95 zarokbûn, jiyana xwe ji dest dabûn. Herwiha zêdetirî 334 zarok jî birîndar bibûn, gelek ji wan zarokên birîndar jî perçên laşê xwe ji ber êrîşan, winda kirine.

### Dijminê mirovahiyê ji xwîna zarokên Kurdan têr nabe

Piştî êrîşên hovane yên dewleta Tirk ya dagirker û çeteyên wê yên ser Efrînê û berxwedana gelê Efrînê ku 58 rojan bi lehengî dewam kir, di 16'ê Adara 2018'an de gelê Efrînê neçar ma ku ji Efrîn derkeve û koçberî herêma Şehbayê bibe. Gelê ku koçberî Şehabayê bûn, xwe di gundewarê herêmê de bi cih kirin. Herwiha kampên bi navê Berxwedan, Serdem, Veger, Efrîn û Şehbayê ji xwe re ava kirin. Êrîşên ku 58 rojan dewam kiribû û rewşa koçberiyê, guhartina war û zehmetiyên ku bi gîştî gel tê re derbas bû, herî zêde bandor li ser piskeolojiya zarokan kir. Tevî ku gel koçberî Şehbayê bû jî, lê êrîşên dewleta Tirk ya dagirker ranewastiyan û zêdetir bûn. Her êrişekê wê bû sedemê canekî zarokekî.

### Dagirkerî komkujiyan li pê hev pêk anîn

Li herêma Şehbayê gelê Efrînê ji nûve di bin şert û mercên zehmet de, derfetên jiyanê afirandin û xwe bi cih kirin, lê dîsa jî ji êrîş û topbaranên dagirkeriya Tirkiyê xilas nebûn. Dewleta tirk ya dagirker, gelek caran li dijî gel, li dijî zarokan komkujî pêk anîn; di sala 2019'an de li Til Rifetê, dema ku komeke zarokan dilîstin ew kirin hedef. Di encamê de 10 kes ku ji wan 8 zarok bûn, jiyana xwe ji dest dan. Piştê wê bi demeke kurt disa dagirkiya Tirk li gundê Aqîbê ya navçeya Şêrawa, malbatek kir hedef û di encamê de malbata ku ji dayîk , bav û zarokekî pêk dihat, şehîd bûn. Di 4'ê Tebaxa 2022'an de, li bajarokê Til Rifetê 5 zarok bi balafira keşfê hatin hedef girtin û keça bi navê Fehîme Reşo ya 17 salî di encama wê êrîşê de Şehîd bû û hevalênwê jî birîndar bûn. Di sala 2022'an de bi gîştî 10 zarokên li herêma Şahba di encama êrîşên dagirkeriyê de jiyana xwe ji dest dan.

### Dorpêça hikumeta Şamê 15 hezar zarok ji xwandinê qut kirin e

Li herma Şehbayê tenê kiryarên dewleta Tirk a dagirker nebûn, li kêleka êrîşên dagirkeriyê hikumeta Şamê li hemberî gel, polîtîka birçîbûnê bi rêya ambargoyê dide teyîsandin. Ev ambargo ji destpêka derbasbûna gelê Efrînê ji herêmê re, bi awayekî domdar tê meşandin. Ji bo derbaskirina madeya sotemeniyê û derman baceyekî pir mezin ji Rêveberiya Xweser werdigirin, bi taybet ev ambargo ji du heyvan de bi awayekî giran li ser gelê herêmê û her du taxên helebê Eşrefiyê û Şêxmaqsud hatiye ferzkirin. Bi hatina demsala zivistanê re hikumeta Şamê derbaskirina madeyên sotemeniyê ji bo herêma Şehba û taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê bi giştî qedexe kir. Di encama vê siyasetê de dibistanên zarokan hatine sekinandin û 15 hezar xwendekar ji xwendinê hatine qutkirin.













### Siyaseta Kuştin û birçîkirinê dewam dike

Dorpêça hikumeta Şamê li ser herêma Şehbayê, bandora xwe li ser tavahî aliyên jiyana civakê û tevgera gel kir, ji wê zêdetir bi taybet rewşa tenduristî ya zarokan ket xeteriyê. Di nexweşxaneya herêma Şehbayê û ya her du taxên Helebê de, bi dehan zarok bi nexwşiyên zivistanê yên weke (Rebû û Îltîhab qesebat û hwd...) ketine. Ev nexweşî di encama sermagirtinek giran de rû didin. Tevî rewşa dorpêçê û tunebûna madeyên tedawîkirinê, lê dîsa jî nexweşxaneyên herêmê tavahî zarokan pêşwazî dike da ku rêjeya nexweşiyan zêde nebe.

Siyaseta hikumeta Şamê weke kuştina hêdî hêdî em dikarin bi nav bikin. Herî dawî di encama dorpêça hikumeta Şamê de, li Helebê zarokê bi nav Wîsam Sîdo yê 4 salî û Hisên Ebdallah Kîbar yê 17 rojî, di encama sermayê de jiyanan xwe ji dest dan. Tevî hemû kiriyar û sûcên li dijî zarokên Efrînê jî, weke her car rêxistinên mafên mirovan xwe ker , kur û lala dikin. Hêjayî gotinê ye ku bi gîştî hejmara zarokên ku di her 5 kampên koçberên Efrînê yên herêma Şehbayê, taxên Helebê Şêxmesud û Eşrefiyê zêdetirî 35 hezar zarokanin.

## Li Sûriyê dijî demokrasî komplo tê rêxistinkirin

**Zekî BEDRAN**



Aloziya pergala Kapîtalîst di asta cîhanêde her ku diçe zêde dibe. Piştî rûxandina yekîtiya Sovyet serkeftinê xwe li dar xistibû. Dawiya îdeolojiyan hatibû. Lê cîhê ku gîhîştiyê, mirov dikare bêje dawîya cîhanê hatiye. Tewazinê ku piştî şerê cîhanê yê 2'an hatibû avakirin, hilweşiya. Tewazinê nûh jî hîn nehatine avakirin. Cîhan, ji bo gelan bû cîhekî hîn xetertir. Pêre şer û lêgerîna xwe bi çek kirin jî, zêde dibe. Ewropa, Rûsya û DYA, bi şerê Ukrayna ketin nava nakokî, şer û rikeberiyeke hîn eşkeretir.

Pergala kapîtalizm, nikare pirsgirêkên mirovahiyê çareser bike, berovajî vê li holêye ku çavkaniyê pirsgirêkan e. Aloziyên Aborî, Enflasyon, bêkarî, zêdebûna bê edalatî û aloziyên siyasî, dihêle ku şer zêde bibe. Di mijara Ekolojîyê de, cîhan hatiye ber xela yê. Avhewaya cîhanê, bi lez tê gûhertin. Ked a mirovan û xweza, bi çavbirçîtiyek mezin tê talankirin. Weke sincî jî, hilweşandin û xerabûn her ku diçe kûrtir dibe. Di encamêde pergala kapîtalîzm, weke Rêber Apo pênase kirî taybetmendiyên wê yên şikandina civakê hîn zêdetir derdikevin holê. Weke tê zanîn Rojhilata Navîn, cîhê herî zêde ev aloziya bi şer bi kûrahî û berfirehî tê jiyankirin e. Şer û nakokiyên bi xwîn, qet nesekinîn. Rêveberiyên diktator yên ku ji civak qût bûne, girêdayî pergala emperyalîzmên e, welatê xwe weke dagirkeran bi rêve dibin. Li hember van neheqiyan û xizaniyan, serhildanên bi navê 'Bahara Ereban' hatin rojevê. Bahara Gelan, Rojhilata Navîn hejand. Hin rêjîm hatin rûxandin. Lê ev serhildane ji ber ku bê rêxistin bûn, bi serkeftina gelan bi encam nebûn. Şoreşa gelan hate dizîn. Hêzên noker û lihevker, careke din bi hêzên emperyalîst bûn yek û cewherê şoreşan vala kirin. Ji bo pêşiya azadiyan û demokrasiyê bigrin her tişt kirin. Waha kirin ku, rêxistinên weke DAÎŞ û El Kaîde, kirin bela serê gelan. Ji gelan re gotin ``Yan em û rêveberiyên me yên dîktator, yan jî DAÎŞ û El Kaîde! Hûn yek ji van hilbijêrin."

Weke ''Bahara Ereban'' şerê herî bi xwîn û herî rûxîner li Sûriyê hat jiyên. Rêveberiyê Sûriyê di pergala xwe de gûhertin çênekir. Reformên Demokratik çênekir. Dema bûyer derketin, yekser şerê çekdarî pêşket. Ji derve de gelek hêz mûdaxale kirin. Ji van hêzan, ya sereke Tirkiyê bû. Sînorên xwe ji bo DAÎŞ û rêxistinên din yên çete, vekir. Bi milyonan gelê Sûrî kişand Tirkiyê. Koçberên Sûrî, li hember Ewropa weke amûrek şantajê bikar anî. Di nava wan koçberan de, bi hezaran çekdar derxist in. Bi îxwanciyan û çeteyên din hewl da ku rêveberiyê Sûriyê hilweşîne û welat bixin bin destê xwe, li hev kir. Ji aliyeke din jî, xwastin Kurdan bê bandor bikin û ji holê rakin. Tirkiyê li Sûrîyê xerabiyeke û sûceke ku nekiriye, nema ye. Herêmên weke Efrîn, qirkirina qewmî jî pêkanî. Ango Kurd di qirkirinê de derbas kir. Li cîh û warê Kurdan, çeteyên xwe û malbatê wan, bicîh kir û hemû mal û milkê wan talan kirin.

Tirkiyê di encamde, hem nekarî Kurdan xelas bike, hem jî nekarî rêveberiya Esed birûxîne. Niha bi Esed re careke din ji bo Kurdan ji holê rakin, hevdîtin dane destpêkirin. Rûsya pêşengtî ya vê dike. Hedef ewe ku di van hevdîtin û bazaran de, aşîtî û rehetiya gelên Sûrîyê nîn be. Destkeftiya herî mezinya şerê navxweyî ya Sûriyê, Herêma Xweser a li Bakûr û Rojhilatê Sûrîyê ye. Ev herêm di wateya rastî de, cîhên ku gelên herêmê bihevre bi azadî jiyan dikin e. Rêveberiya Şam`ê bi gîştî pergala baas esas digre û hewl dide, biser bixîne. Rusya bi tenê hewl dide desthilata rêveberiya Esed misoger bike. Gelê Sûriyê di nava xizaniyeke mezinde ye. Kes nikare li hember vê rêveberiyê rexneyekê bike. Dixwazin ev hilweşandin û êşên hatine kişandin, weke xewnek bê jibîr kirin.

Li Sûriyê hemû saziyên ragehandin di bin kontrola dewletêde ye. Partiyek an jî rêxistinek ku rêveberi rexne bike, mafê jiyanê nadin wî. Dibêjin; ``Li Sûriyê yekane sedemê hilweşandin û şer hêzên derve ne! û yek jî Sûriyên xaîn``. Welatek ji bo çi ewqas xaîn avadike? Ne pêkane ev pirs bên pirskirin û bên nîqaşkirin. Ger ev rêveberî bê kêmasî be û hemû tiştê kiribe rast be, bi milyonan mirov çima dev ji axa xwe berdan? Tişteke xweş û rast be, çima mirov pişta xwe bidin? Rêveberî çima gelê xwe bavêje hepsan, rezîl bike û ji îskenceyan derbas bike?

Em li Îran ê îro binerin; bi milyonan mirov bi pêşengtiya jinan, bi mehane li kolanane. Daxwazê wan azadî û demokrasî ye. rêveberiyê Îran`ê şûna ku van daxwazan cîddî bigre û gûhertinan bike. Gelê xwe dikuje. Lêdixe, îskence dike, bi darve dike. Bi şikandin, bi lêdan, û bi tirsandin gelek îdare kirin di kîjan bawerîde û felsefede gûncav e? Rêveberiyek ku, bi Fîşekan êrîşê kolberên xizan ê ku li ser sînoran bi pişta xwe hemalti dikin bike, çawa em qebûlbikin ev rêveberî di rêya heq û hiquqde ye? Bi van rêbazan dikarin emrê xwe çikas dirêj bikin? Rêveberiya Sûriyê şûna kû bi gelê xwe re li hev bike, demokrasî û azadiyê esas bigre, hewl dide bi Erdogan`ê faşîst û çeteyên wî re li hev bike. Yekîtiya welat hezên weke Erdogan ê faşîst pêk nayê. Hember gelê Sûriyê û Şoreşê pir vekiriyê ku komployek tê rêxistin kirin. Dixwazin şoreşa Sûriyê jî bidizin.